

Rejîma Tehranê
“Corona” weke çekeke
terorîstî binav dike

»»» R:7



Şer li Idlibê
ye û silih li nav
garisê Kurda ye

»»» R:5



Di hilbijartina bo
parlemana Îranê,
baykotê serkevtin bi
dest xist

»»» R:6



Korona desteke
din bo mîrê
serkutkar

»»» R:9



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (369) 06-03-2020 Buha (1000) Tûmen

Korona û mifahwergirtina berevajî ya hikûmetî

Di van rojan de êşa “Korona” di Îran û nemaze Kurdistanê Îranê de bûye baseke giştî û tirs jî xîstîye di nav dilê xelkê de, û rewşeke neasayî jî afirandiye. Rewşeke pir hovane ku çavkanî û sebebkarê sereke yê wê, ji aliyê rejîma çewtekar a Tehranê ve ye, ku ne tenê di dema hatin û belavbûna Koronayê de çewtekarî û xapandinkarî kir, belkî niha jî piştî zêdetir ji du mehan hêştta jî amade nîne rewşa neasayî rabigihîne û amar seraşt li derheq tûşbûyî û qurbanîyên wê nesaxiyê belav bike.

Eva ku heya niha wekî amar tê belavkirin komek ji zaniyariyên nefermî ne ku ji aliyê xelkên dilsoj ve bo raya giştî tê belavkirin.

Emê di vir de çend mînakên bînin: Malpera “Kurdistanmedia”yê di nûçeyekê de ku rêketa 14`ê Reşemê belav kiribû nivîsiye: “Rojê yekem di Îranê de ku behsa Koronayê bi fermî hate belavkirin, berpirsên nexweşxaneyê Bokanê yên wekî, “Dr. M.Y”, “D.A” û “N.M” bi gefxwarinê nehêlan ku kadrên dermanî yên wê nexweşxanê “De-mamk” (Maskan) lê

bidin. Kerbideştên nexweşxanê gotibûn ku nabe maskan bi kar bînin, çimkî Korona cihê metirsiyê nîne û xelkê netirsînin. Dema ku cara yekê nexweşek ku guman li ser bû ku nexweşiya Koronayê girtiye, û navê wî hate xwandin, deşt bi kar bûn, û niha jî parek bo qerentîne hatine dîyarîkirin ku 7 nexweş li wir in. Kadrên beşa qerentîne bi kêmtirîn xizmetguzarî mijûlê pereşariyê ne, ku metirsiyeke zêde li ser wan e. Hevdem bi sedema bêpareyîyê, nexweşên Bokanê daxwaz ji xêrxwazan kirine ku alîkariyan wan bikin. Her li Bokanê rejîm dixwaze pareke berçav ji pereştarên Bokanê bo bakurê Îranê veguhêze.

Her vê çavkaniyê di nûçeyê de bas kiriye ku: “Nexweşxaneyên Îranê, emrazên hewce bo nexweşiya Koronayê tunînin û pirsînêlên wan nexweşxaneyan di rewşeke xirab a pizîşkî de kar dikin, û gefeke micid li ser tendurîstiya wan e. Pêka raporê, kêmbûna xizmetguzariyan di asteke de ye ku heya maskên “N95” deşt nakevin û bi cihê



wan bi “qumaş û peroyan” maskan çê dikin. Bi hegera nexweşên tûşbûyê vîrûsa Koronayê, hejmareke zaf a peresdaran, canê wan ketiye metirsiyê, lê bona wê ku qasa zêdekarî û xercê nexweşxaneyan zêde nebe, berpirs amade nînin ku bi ti awayekî di çî beşekê de hejmara peresdaran zêdetir bikin”.

Her di vê derheqê de Cihgirê Serokê Komîsiyona Tendirûştî a Meclîsê gotiye: %41 ew kesên ku tûşê Koronayê bûne, piştî serdana navendên dermanî tûşî vê belayê bûne, wateya wê jî eve ye, ku navendên dermanî di Îranê de ti yek ji wan xwediyê standarên pêwîst bo rûbirûbûn digel Koronayê nînin û di raştî de bûne maka belavbûna zêdetir a Vîrûsê!

Ew mînak tenê nîşan didin ku rejîm di hember wê rewşa kirîzê de ne tenê ti pilanek nîne belkî bi zanebûn di Kurdistanê de hewil bo berfirehbûna nexweşiyê dide! Mînaka berçav ya wê hewla çepel jî eve ye ku şandina mohreyên xwe ji Qumê (yekem navenda Korona)yê ve bo Kurdistanê ye. Eva ku cihê dilxweşiyê ye, ew raştî ye ku xelk nezmaze di Kurdistanê de tu baweriyeke wan bi rejîmê û axavtinên neberpirsên wê rejîmê nemaye, û bixwe hewla paraştina xwe didin, çimkî dizanin ku di welatê belalêdayî a Îranê de tenê bi xwe ne ku dikarin hawra xwe de herin. Di vê derheqê de beşeke berçav ji xelkê bajarên wekî Seqiz, Merîwan û Ciwanroyê tenê bo pêşîgirtin ji belavbûna vîrûsa Koronayê dukan û bazarên xwe daxistine.

Komara Îslamî tenê bûye sedema vê yekê ku li welatên cîranên Îranê, xelk bi henekkirinê digel yekîneyê siyasî- cografîyayî yên Îranê biaxivin, Wezîrê Tendirûştî ê Tirkiyê di nûtirîn civînê de basa vê yekê kiriye, ku di deştpekê de me pêşniyar bi Îranê kir ku bajarê Qumê qerentîne bikin gotin pêwîst nîne. Niha ku raştî arîşeyeke kûr hatine daxwaza hevkarîyê ji me dikin! me jî got: Pêwîst nîne em bînin ya hûn bînin, emê ji riya “Skayp”ê ve biaxivin!

Sergotar

Wêrankirin di nav
gendelkariyê de

N: Kerîm Perwîzî

Sîstema Koloniyalîstî ya hakim li Îranê, di hem-ber nexweşiyê wêrankar ya wekî Koronayê de, ne alîkariya xelkê kir û ne jî sîstemek bo tendirustî ava kir ku bi hawara xelkê de here, belkî bixwe bi sedema anîna wê nesaxiyê û bi biryarên paşmayî û dijîmirovahî ji rêya „Mahan Air“ê ve Korona anî Îranê û herwisa ji rêya qerentînenekirina Qumê ve, di nav tev Îranê de belav kir. Niha tev Îran Korona girtiye û hemû civatgeha Îranê gefa Koronayê li ser wan e û civatgeh bixwe digel wê nesaxiyê şer dike.

Rejîm bi tenê mijûlê parastina kesên nêzî xwe û berpirsên xwe ye û Spaha Pasdaran jî mijûlê gendelîkirinê ye ku tiştên saxte difiroşe xelkê! Niha tev civatgeha Îranê metirsiya vîrûsa Koronayê li ser wan e, û ti hêviyê wan bi dezgehên Tendirustî yê rejîmê nînin, û bixwe mijûlê xweparastina canê xwe ne. Di wê demê de ku tev Îran mijûlê Koronayê ye, rejîma Îranê jî mijûlê gendelkariyan e, ku piştî derbasbûna Koronayê jî, jiyana wê civatgehê aram nabe.

Di van rojan de, bi sedema ku rejîmê mercên navdewletî qebûl nekirin, Îran kete nav rêzbenda reş a sîstema cihanî ya li dijî spîkirina pare û vê biryarê bazîrganî û aborî ya Îranê zêdetir wêran kir. Her di wan rojan de, dûbare Ajansa Navneteweyî a Wize a Navkî di raporekê de dabû zanîn ku, Komara Îslamî bilez Oraniyoma meyandî zêde dike û sê binkeyên din ên navkî hene, ku rê bi ajansê re nedaye serdana wan bike!

Di heman demê de wê rejîmê hem pêşî ji firîna balafirên „Mahan“ bo welatê Çînê ne

Mîstefa Hicrî di peyamekê de pîrozbahî li Mesûd Tek kir



Lêpirsyarê Giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê “Mîstefa Hicrî”, di peyamekê de bi boneya dawîhatina 2’emîn kongereya Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) û hîlbijartina “Mesûd Tek”, wekî Serokê Giştî yê wê Partiyê pîrozbahî kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Rêzdar “Mesûd Tek”

Sekreterê Giştî ê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê

Tevî silavekî gerim

Em agehdarin kirin ku kongereya we bi awayekî serketî dawî pêhatiye, û tuyî rêzdar jî, wekî Sekreterê Giştî ê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê hatiyê hîlbijartin.

Em bi wê boneyê pîrozbahiyekî gerim pêşkêşê teyê rêzdar û tev endamên rêberayeti yê nû hîlbijartî û bi giştî Partiya Sosyalîst dîkin û em hêviya serketinê ji bo ve dixwazin.

Em alxahînin ku birayeti û pêwendiyên dostane yê du Partiyên Demokrat a Kurdistanê Îranê û Partiya Sosyalîst a Kurdistanê dê her berdewam bin.

“Mîstefa Hicrî”

Lêpirsyarê Giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

15`ê Reşeme a 1398`an

5`ê Adar a 2020`an

girt, û bi berdewamî jî mijûlê anîn û birina tiştên nexuya bû, û di heman demê de jî Sîstema Tendirustî a Cihanî ragihand, ku ew rejîme li derheq kontirolkirina nesaxiya Koronayê de rastî şikestê hatiye, û amarên wê jî rastî nînin!

Di halekê de ku fezaya rewanî ya Koronayê, mijûl e bi bédengî derbas dibe, rejîma Îranê di roj û mehên pêşerojê de, rastî givaş û cezayên zêdetir tê, û jiyana xelkê zêdetir rastî metirsiyan dibê.

Di wê demê de ku jiyana civatgehê rastî hejariyê giran hatiye û Koronayê jî hêza civatgehê birrî ye, ti sîstemeke din a dîktatorî weha nebûne, bo mînak, sîstema dîktatorî a Çînê di hizra civatgehê de bûye, û hemû îmkaneke bo parastina canê civatgehê dabûn dike, da ku belaya wê nesaxiyê jê vebe. Lê rejîma Wilayeta Feqîh, naşibhe ti sîstemeke dîktatorên, û ji bo malwêraniya xelkê dest ji wêrankariyên xwe bernade, û paşeroja Îranê ber bi karesatê ve dibe.

Di welatên din de belkî Korona jiyana xelkê bêxe metirsiyê û piştê bi berengarîkirin a hemû aliyekî, wê nesaxiyê derbas bikin û bigihîjine qonaxa asûdebûnê. Lê di Îranê de piştî derbasbûna Koronayê, ti asûdeyîyek tunabe, û niha rejîma Wilayeta Feqîh, mijûl e ku roj û mehên piştî derbasbûna Koronayê jî wêran dike.

Çavkaniya karesat a civatgeha Îranê, rejîma Koloniyalîstî a hakim e û tenê bi hişkririna bingehe wê rejîmê û agirberdana cenazê rejîmê, xelkên Îranê wê demê dikarin bi asûdeyî bijin.

Peyama “Mîstefa Hicrî” li derheq berketiyên erdheja Xoyê û Kutolê

Lêpirsyarê Giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê “Mîstefa Hicrî”, di pey-amekê de bo xelkê berketiyên redheja Xoy û Kutolê, tevî wê ku sersaxî gote malbatên can jidestdayan û daxwaz jî kir ku bi hawara xelkê wan derveran ve biçin.

Deqa peyamê wiha ye:

Zirarberketiyên redheja çend roj pêş niha herdu aliyên Kurdistana li Tirkîye û Îranê, careke din sibêdeh û êvara roja Yekşemî 4`ê Reşemê, raştî erdhejeke din hatin û di encamê de di wê zivîştana sir û tijî li befir, hezaran mal û cihê jiyana wan herifîn û zêdetir ji 100 kes jî birîndar bûn û li beşa Kurdistana Tir-



kiyê jî, 9 kesan canê xwe ji deşt da.

Ew bûyera dilêş, birîneke kûr e li ser leşê Kurdistana birîndar û bû sedema xem û perîşaniya gelê me.

Niha ew malbatên lêqewimî çavnihêrî hemû core alîkariyek ji

aliyê hevniştimaniyan ve ne ku bigihe wan, bo vê ku di wê demsala sir û seqemê de reaşî bûyerên zêdetir nebin, çimkî şik têde nîne ku ji aliyê rejîma Îranê ve ti alîkariyek nagihe deştê wan.

Em jî di wê bûyerê de dax-bari in û sersaxiyê li malbatên can ji deştdayî dikin û em hêvî dikin ku birînen wan bi zûtirîn dem nûjdar bibin.

Lêpirsyarê Giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê

Mîstefa Hicrî

6`ê Reşeme a 1398`an

25`ê Şibat a 2020`an

Çeperên xebatê avedantir dibin

Dewreyeke din ya deşt pêkî a pêşmergeyên PDKÎ bi awaykî serketî bidawî hat û refek din ji kur û keçên xebatkar, tevî çeperên xweragiriye bûn.

Roja Înê, 9`ê Reşeme, dewreya 241 a deşt pêkî ya Pêşmerge, ji aliyê Fêrgehê Hêza Pêşmerge Kurdistana ve û bi rê ve çû, birêvebirina rêûresmê li çiyayên Kurdistana bidawî hat.

Deşt pêka wê rêûresmê, bi xwendina sirûda netewî a “Ey Reqîb”, û sekîndandina xûlek bêdengî jibo rêzgir-tin ji canê paqij ê Şehîdên Kurd û Kurdistana ji aliyê beşdarbûyên dewreyê ve deşt pêkir.

Ew rêûresme bi beşdariya berpirsên siyasî û leşkerî, kadir û pêşmergeyan ve bi rê ve çû.

Di wê rêûresmê de, Fermandeyê Hêza 115 a Hêza Pêşmerge Kurdistana, “Behmen Dêhqan”, bi boneya dawî hatina dewreyê 241 a deşt pêkî ya pêşmerge çend gotinek pêşkêş kir.

Piştî helbestek bi navê “Ez



kîme” (Min Kêm), ji aliyê beşdarbûya dewreyê, “Mehnaz”ê ve hate pêşkêşkirin.

Di berdewamiya rêûresmê de, rapora Perwerde ya Fêrgehê, ji aliyê mamostayê Fêrgehê, “Xelîl Milan” ve hate xwendin.

Piştî helbestek bi navê “Kurd û Neyar”, ji aliyê beşdarbûyê dewrê, “Jîwan” ve, hate pêşkêşkirin.

Peyama dewreya 241 a deşt pêkî ya Pêşmerge, ji aliyê beşdarbûyê dewreyê “Dana” ve hate xwendin.

Piştî xwendina peyama dewreyê, ji aliyê beşdarbûyên dewreyê ve sirûdek bi navê “Pêşmerge” hate pêşkêşkirin.

Wekî resma hemû dewreyan, 3 kesên yekem ji aliyê ceribandina leşkerî û siyasî, û 3 kesên yekem jî, ji aliyê reftar û disîplînê ve hatine xelatkirin.

Ew xelatane ji aliyê “Behmen Dêhqan” û herwisa “Budax Budaxî” ve, bi serketiyên wê dewreyê di wan 2 qonaxan de, hatine pêşkêşkirin.

Rêûresim bi sitrandina sitranek ji aliyê beşdarbûyeke dewrê bi navê “Se`idî” ve û xwendina helbestek bi navê “Newroz û Agir” ku ji aliyê Pêşmerge hêza 122 a Hêza Pêşmerge Kurdistana, “Îhsan Reştigar” ve hatibû pêşkêşkirin, bi dawî hat.

Vîrûsa Korona çima bi qazancê rejîmê ye?



N: Nûredîn Sofizade

Herwekî hemû aliyek hay-dare, vîrûsa Koronayê di welatê Çînê de peyda bû û gelek nekêşa ku gihîşe zêdetir ji 70 welatên cîhanê.


Ew nesaxiya cihê tirsê û bikuj gelek zû gihîştê Îranê jî, û piştî welatê çînê di Îranê de pêka welatên dinê zêdetirîn qurbanî jê ketin.

Korona di rewşekê de gihîştê Îranê ku ew welate panguriyê dehan pirsgerêkên Siyasî, ewlehî, aborî û civakî bû. Di demeke wisa de, rejîmê hewil da ku hemû raştîyên belavbûn û tûşbûn û amara mirna bi vîrûsê weşere, ku herwisa jî kir.

Bi berçavgirtina weşartina raştîyan ji aliyê rejîmê ve, em dikarin bêjin ku desthilatdarên rejîmê gelek bê meyl jî nebûne vîrûseke wiha cihê tirsê û bikuj, bikeve hundirê welat, bê guman rejîmê Korona wekî milyaketê ku hewarê de hatin dizanî, lewma hemû raştî weşartin heta ku demekê rabigihînin êdî bo berahîk girtinê direng bibe. Mebesta rejîma Îranê ji weşartina raştîya derbare Koronayê di nava Îranê de çi bû?

Min jêye ku em dikarin wan xalane bi mînakên herî serêke bas bikin, hingê armanca çepel û weşartî a rejîmê ya piştî perdê xuya dibe.

1 – Piştî tepeseriya hovane ya xwenîşandana meha Xezelwera derbasbûyî ku zêdetir ji 1500 kes ji xwenîşanderan û ji wan dehan zarok ji aliyê hêzên rejîmê û bi biryara ras-



texwe ya Elî Xamineyî ve hatine kuştin û hezaran kes hatine girtin, rejîm amade nebû ne amarekî raştî li ser kuştîyan û ne li ser girtiyan belav bike, ne jî amade bû termê kuştîyan teslîmê malbatên wan bike, rejîmê egera hindê lêdida û nîgeranê hindê bû ku careke dinê rege serhil-dana xelkê Îranê dest pê bike, desthilatdarên rejîmê xwe di bin givaşa xelkê de didîtin, lewma wan jêye ku hatina vîrûseke wiha bikuj dikare xelkê mijûl bike û vîrûsê li ser rejîmê kêmbike. Mixabin herwisa ne û niha hemû xelkê Îranê kevtine fikra hindê de kanê çawan bikarin xwe ji tûşbûna bi Koronayê biparêzin.

2 – Xiştina balafira Ukrayînê ji aliyê Spaha Pasdaran a terorîst ve, bû sedema can jidestdana 176 kesian, rejîmê ku destpêkê amade nebû rabigehîne ku Spahê ew balafir li Tehranê xiştiye xwarê, lê dema raştî derkevtin, rejîm amade nebû “sindoqa reş” ya wê balafirê teslîmê Ukrayînê bike, li devedevê zêdebûna roj bi roj a givaşên navnetewî bo ser Îranê bona evê ku hem sindoqê teslîm bike, hem xisarê bide Ukrayînê û malbatên wan kesên ku di wê balafirê de canê xwe ji dest dan, raşt wê demê de gihêştina Koronayê bo nava Îranê bû nûçeya yekem li hemû cîhanê û wê rojê pêde basê balafirê û “sindoqa reş” û xisar vergirtina ji rejîmê nehatiye kirin. Eve jî xweziya dilê desthilatdarên rejîmê bû û gihîştine xweziya xwe.


3 – Korona di demekê de bû mewanê ber dilê rejîma Îranê ku, mesela navokî ya rejîmê û nîgeraniya cîhanê rojev bû û bala hemû cîhanê bo aliyê xwe ve rakêşa bû, rojane basê ceza xistin û egera êrîş û dorpêçên zêdetir bo ser rejîmê li astê dinyayê dihate kirin û rejîmê bêhnên xwe yê dawiyê dikêşand, Ajansa Navnetewî ya Navokî, welatên aliyê danûstandinkar yên Ewropayê li ser pîrsa Etomiya Îranê, Amerîka hindî pê diçû givaşên xwe bo ser rejîma Îranê zêdetir dikirin, ku nişkê ve vîrûsa Koronayê hemû ew mesela ji bîr bir, rejîmê ev yeke bi derfet zanî ku bilez çalakîyên Navokî yên xwe dûr ji givaş û çavê dunyayê bidomîne.

Lewma ji Koronayê baştir çi tiştê nedikarî hawara rejîmê de bê.

4 – Di demekê de ku bi merema kontroolkirina geryana dirafê Îranê, ku wisa dihate zanîn parek ji alîkariya malî bo girûpên terorîstî di welatên deverê de ji aliyê rejîma Îranê ve tête kirin û hinartin, Saziya “FATF” çendîn caran daxwaz ji rejîma Îranê kir ku vîrûsê lihevkerina cîhanî wajo bike û xalên wê berçav bigre, û rejîmê di navbera wajokirina “FATF”ê û alîkariya bi girûpên terorîst re, girûpên terorîstî hilbijartin, lewma “FATF”yê Îran xiste nava lîsteya reş a xwe û hemû danûstandina diravî ya Îranê dibe bête qedexekirin, ew pîrse bibû rojeva nûçeyên cîhanê û rejîmê baş dizanî ku ew yeke dê bandoreke mezin a nerênî dabinê ser aboriya Îranê, û rege nerizayetiya xelkê biteqe, lewma di demeke wiha de, Koronayê karî bi hawara rejîmê ve here û wê meselê jî wekî meselên dinê ji bîr herin.

Lê hekî di wan 4 xalan de yan rege gelek warên dinê de jî hatina Koronayê karî alîkariya rejîmê bike, her lewma jî desthilatdarên rejîmê, vîrûsa Koronayê bo dawîhatina tev pirsgerêkên xwe di bin barê wan hemû givaşan de, wekî melekê hewarhatinê (Frişyê Necat) dizanin, bê guman zû yan direng, Korona jî dê tewaw be, û hingê ti tiştê nikare berahîka sernixûniya wê rejîmê bigre.

Şer li Idlibê ye û silih li nav garisê Kurda ye



N: Ebdulêzîz Qasim

Wekî diyar e ku Tirkîyê her ji deştêpêka krîza Sûriyê ve, du armancên sereke hene û siyaseta Tirkîyê hemû dikeve di çarçoveya wan herdu armancan de, yekem armanc ku Kurd li Sûriyê nebîn xudan statûyek û duyem ku Tirkîyê li Kurdiştana Sûriyê devereke “ewle” li gorî ewlehiya xwe ava bike, ku Tirkîyê di armanca xwe ya yekem de heta radeyekê serkeftineke mezin bi deşt xwe anî, lê nikarî devera “ewle” ava bike, û herwiha nikarî deverên di bin kontrola xwe de avadan bike, li gorî wekî Tirkîya dixwest ku wan deveran ava bike bi piştgiyariya darayî ya erebî û “Europe” li gorî projeyê avadankirina Sûriyê, bi taybetî ku dagîrkeriya wê ya li ser Girêspî û Serêkaniyê raştî reaksiyonek navdewletî bihêz hat, cuda ji ya Efrînê. Her di vê çarçoveyê de xuya



dibe ku Tirkîyê ti armanc li Idlibê nînin, û şerê wê li Idlibê yan ji bo bazaran bike li ser dagîrkirina devereke din ya Kurdî, û yan jî ji bo dirêjkirina krîza Sûriyê ye, û dibe ku Tirkîya li gorî planeke “Rûsî” yan “Amerîkî” tevî Idlibê bûye?! Li gorî hin şirovekarên ku Tirkîyê dixwaze bazarê li ser Idlibê bike beramber Kobanê, wek heman bazarên li ser Efrînê û Serêkaniyê, û li dawiyê şer li ser Idlibê be û rêkeftin li ser bajarekê Kurdî be, wek serpêhatiya Kurdî “siliha çûkên zozana li nav garisê Mema ye”. (Mema nave eşîreteke Kurda ye).

Lê divê xuya bikin ku piştî dagîrkeriya Tirkîyê ya li ser Serêkaniyê, ku dibe dewletên “Europe” û heta Amerîka nehlîn Tirkîyê careke din sînorên niha derbas bike, bi taybetî ku niha gelek kar û xebat dibe li ser asteke cihanî ji bo komkirin û dukomintkirina tawanên şer û dijemirov yên bi deştê artêşa Tirkîyê û opozisyona Sûriyê li dijî gelê Kurd û bi taybetî kiryarên kuştin û guhertina demografi li Efrîn û Serêkaniyê û Girêspî û tevî ku Tirkîya têkşikest ji bo wergirtina piştgiyariya darayî ji dewletên erebî û “Europe” ji bo temamkirina projeyên xwe yên siyasî û aborî li van navçeyên dagîrkirî, û dibe ku hewlên Tirkîyê yên niha ji bo vekirina sînorên xwe yên bi “Europe” re li pêşiya koçberan wekî karteke fişarê be li dijî helwestên dewletên “Europe” û “NATO”, lewra dibînim ku Tirkîyê nikare qomareke din bike li nav deverên Kurdî, lê tevî

wiha jî tirs li ser deverên Kurdî hêjî heye û bawerî bi tirkan nabe û “nanê wan li ser kaba wa ye”.


Tiştê îro li Idlibê dibe, xuya dike ku rejîma Sûriyê û Îran û Rûsiya serketin û herwiha xuya kir ku Tirkîyê nikare ji bazinê Soçî derkeve, û dibe bi çavdêriya Rûsiya rêkeftineke nû ya raşterast bibe di navbera rejîma Sûriyê û Tirkîyê de, tevî ku danûstandinên ewlekarî di navbera her du aliyan de berdewam in, û helbet heger rewş siyasî û leşkerî li gorî rêkeftinên di navbera Tirkîya û Îran û Sûriyê de berdewam bin, ku ev yek jî wê nekevin di xizmeta doza Kurdî de, û wê rewşa miletê Kurd li tevaya Kurdiştana Sûriyê bêxe di bin metirsiyeke mezin de, nemaze ku heta niha Amerîka çî planeke zela nîne derbarê rewşa Sûriyê bi giştî û sîberoja miletê Kurd bi taybetî, nemaze ku daxuyaniya vê dawiyê ya serokê rejîma Sûriyê Bişar Esed piştî neh salan ji şer û komkujiyan ku dibêje: “Ti doz nîne bi navê doza Kurdî li Sûriyê”, cihê metirsiyeke mezin e, ku heta niha ne rejîm û ne jî opozisyon danasîn bi mafên gelê Kurd nekirine, û li dijî xwest û mafên gelê Kurd yek deng û yek helwest in, lewra divê Kurd li pey alternatîvan bigerin li ser hemû astên siyasî û leşkerî û diplomatîk.

Hepsiyên siyasî di girtîgeha Urmiyê de ji mirexesiye bêpar in

Pîştî belavbûna vîrûsa Koronayê di girtîgeha navendî a bajarê Urmiyê de, heya niha jî hepsiyên siyasî ji dana mirexesiye bêpar in.

Çavkaniyeke aghedar di girtîgeha bajarê Urmiyê de bi Ajansa nûçegihaniya “Kurdpa”yê re daye zanî, ku dadwerê çavdêr ê girtîgehê bi hêncetên cuda ji dana mirexesî bi herpsiyên siaysdî re xwe diparêze.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Ew kiryara dadwerê çavdêr ê girtîgehê, raştî nerizayetiya



tûnd a hepsiyên siaysî û malbatên wan hatiye”.

Wê çavkaniyê di berdewamiyê de got: Bona dana mirexesî bi hepsiyên siyasî re daxwaza barimteyên giran dikan, ku hin

kes ji wan hepsiyên siyasî bi sedema kirîza ku heye û nebûna daraiyeke baş, nikarin wan barimteyên giran danên.

Piştî belavbûna vîrûsa Koronayê di Îran û Kurdiştanê de, Serokê Dadweriya Îranê, di bexşnameyekê de bi tev navendên Dadwerî re ragihandiyê ku, heya 15`ê Xakelêweya sala 1399`an, bi awayên danina barimteyê, mirexesî bi hepsiyan re bê danê, lê ew bexşnameye bo ew hepsiyên ku cezayên wan bi 5 salan zêdetir be ji xwe nagire.

Di hilbijartina bo parlemana Îranê, baykotê serkevtin bi dest xist




N: Elî Munezemî

Rêjîma Komara Îslamiya Îranê di 2-ê Adara 1398-an yan mişextiya Roji gerra 11-an ya hilbijartinên parlemani bi rê ve bir ku xala cudahiya wê gerra nû li tev yên berê di wê hindê de bû ku pirra-niya wan kesên ku xwediyê mafê dengdanê bûn, neçûne ser sendûqan û bi wî rengî riya xwe li riya rêjîma Xumeynî cuda kirin. Girîngiya wî karî nîşana wê hindê ye ku bi zelalî hate xuyakirin ku xelk armancên rêjîmê bi yên xwe nizane û gava armanc ne yek be, îdî hilbijartina alavên ku di xizmeta gihîştin bi armancên rêjîmê bi xwe de ne, tu wateyek bo xelkê nine. Rêjîmê hergav di heyamê wan 40 salên temenê xwe de cehd dikir ku nakokiyên di navbera xwe û xelkê de wek pirsgerêk û nakokiyên teknîkî bide nîşandan û hemû astengiyên qada siyasî, civakî, aborî û exlaqî wek nakokiyên ji ber hilbijartina gihîştin bi armancên hevpar bêxe ber çavên bîrûraya cîhanê. Lê xelkê wê carê bi baykotkirina hilbijartinê û neçûna ser sendûqan, karî berevajî wê yekê biselîmîne û nîşan bide ku maf û azadiya xwe nas dike û ew maf û azadî, ne ew in ku rêjîmê di heyamê wan 40 salan de bo wan formole kirine.

Xelkê Îranê baş dizane ku azadî tenê ne hilbijartin e. Ewan baykot bi kar anî da ku xala berevajî ya xwaştêka rêjîmê di pişt ewran de derbikeve û şer û pêşbirkêya navbera 2 sîstîmên hizrî ku bersivên cuda pirsên girêdayî bi azadî yan tepeseriyê hene, eşkere bibe.

Di amarên rêjîmê de aşt



pişikdariya xelkê di hilbijartinê de li sedan 41 hatiye ragehandin. Eger em vê yekê wisa dabinên ku rast be jî, em nikarin wê hindê berçav negrin ku wek mînak, karmendên dayireyê hikûmetî di bin givaşa rêjîmê de neçar dimînin ku beşdar bin. Bikaranîna zorê di her formekê de li hember her kesê, bêparkirina wî merivî ji azadiyê ye. “Azadiya her merivekî/ê ew qas e ku hîç merivek yan komê xwe tevli şola wî/ê neke. Azadiya siyasî jî tê wê wateyê ku meriv bikare bê ku pêşiya wî li aliyê kesek din ve bê girtin, bikaribe karê xwe bike.” Dema ku kesek ji rêka gihîştin bi armanca xwe ya siyasî hatine sekinandin û astengî jê re hatibin çêkirin, yanî ew kesa ne xwediyê azadiya xwe ya siyasî ye. Kesek karmendê hikûmetê jî ku zext lê hatiye kirin da ku beşdarê hilbijartinê bibe, yanî azadiya wî ya siyasî jê hatiye zeftkirin û berevajî îradeya xwe tevgeriyaye. Eger em wê hindê berçav bigrin, aşt beşdarên rastîn di wê hilbijartinê de gelek kêmtir ji ya ku rêjîmê ragihandî ye.

Eger em bixwazin bi kurtasî bas li wan sedemên ku bûne sedem ku xelk hilbijartinê hinde berfireh baykot bike, em dikarin girîngtirînê wan bi vî awayî rêz bikin:

-Rêjîma Îslamiya Îranê, rêjîmek totalîter e ku di heyama 40 salî de bûye sedema hiloşiyana civakî ku li ber nebûna azadiyê, meydana destpêşxeriyê, întisîyatîv û zanebûnê, hêza hizrî û şehameta exlaqî tune bibe, û civak nekaribe xwe rabigre

û biherife.

-Xelkê Îranê têgihîşt ku teslîmbûn û bédengiya wan li hember rêjîmê, bi wateya şikesta wan ya yekcarekî di jiyana wan de ye, û eva rêjîmek e ku çi sinûrekê naparêze.

-Xelk têgihîşt ku eger li hember rêjîmê de neseke, ew rêjîma hind har û hov e ku çi fezyek mînimom bo xelkê ku nekeve ber destdirêjiya karbideştên rêjîmê, di jiyana wan de nemaye. Desthilatdaran çi sînorek di jiyana xasmanî ya xelkê de jî nemaye ku bînpê nekin.

-Xelk ji hilbijartinê sil nine; lê ew li armancên xirab yê rêjîmê li hilbijartinê bi kerb û kîn e.

-Xelk dibîne ku di nava wan de hezaran kes hene ku li mohreyên rêjîmê jêhatîtir û zanatir in. Lê ewa sîstîm e ku ew li beşdariya rastîn di jiyana siyasî ya welat de bêpar hêlane.

-Xelk pirsgerêkan hemûyan li çavê rêjîme de dibîne. Gava ku perê wan tune, nanekê bikin, ewa ne li ber jêhatînebûna wan e. Lê eva tê wê wateyê ku serwet û samana xelkê li aliyê kesên din ve deşt bi ser de hatiye girtin ku nahêle xelk bibe xwediyê serwet û samana xwe ku bikare serfiraz bijî.

-Gelên Îran bi giştî xwediyê şariştaniyeteke mezin in. Kesên xwedî şariştaniyet xwediyê hez û meyla li holê rakirina bindestiyê ne, û dixwazin li azadiya xwe xwedî derkevin. Rêjîmê wan hemû salan cehd kir ku xelkê li bindestiyê de bihêle, dijberiya şariştaniyeta wan kir û

xwest exlaqê wan bikuje. Lê xelkê bi baykotê nîşan dan ku nahêlin ew şariştaniyet bimre û ew yek bi baykotê îlan kirin.

-Xelk gihîştine wê raştiyê ku bixwe xwediyê şî'ûr û têgihîştinê ye û pê eyan e, ku wek bûnewerek xwedî îrade, hizr, çalak û berpirsiyar e, û dikare hilsengandina xwe bike û li navbera başî û xirabiyê de, ya baş hilbijêre. Yanî xelk zivirî bo ser wê raştiyê ku bixwe mezin û serwerê xwe ye û nikare û naxwaze xulam û kolê kesek din be.

-Zaf kesan ku berê xwe kişandibûne nav kela xwe û hêviya qeza û qederê bûn, nekarîn wê care bêhelwêst bimînin û zanîn ku paşekiş bo nava kela xwe, nikare azadiya wan bo heta-hetayê desteber bike. Lewra ya baş eva ye ku li hember rêjîmê de bisekinin, û eva bi şikesta rêjîmê ye, ku azadiya rastîn û berfireh yê biafire.

Encam:

Xelkê Îranê bi giştî û yekgirtî bi baykota hilbijartina parlemani karî di xebata xwe li hember rêjîma totalîter ya Îslamî de serkevtineke mezin tomar bikin û bidin eyan kirin ku armanc, rê û rêbaza wan û rêjîmê lihev cuda ne. Ewê yekê bi awayekî aştiyane derbeyek mezin li rêjîmê da û heşt bawer bixwe hebûnê dîsa cem xelkê vegeşand. Xelkê Îranê ne dijberiya xwezaya hilbijartinê, lê dijberiya rêjîmê û nîyet û qesda wan ya nepakîj ku li pişt hilbijartinê wek mêtodek dêmokratîk vedîştartin, kirin. Serkevtina baykotê, serkevtina îradeya gelan bû bi ser rêjîmê de.

Jêder:

Isaiah Berlin, “TWO CONCEPTS OF LIBERTY,” Four Essays On Liberty, (Oxford, England: Oxford University Press, 1969), p. 118-172. https://cactus.dixie.edu/green/B_Readings/I_Berlin%20Two%20Concepts%20of%20Liberty.pdf

Nerîna Lîderan



Brian Hook:

“Îranê alîkariya me qebûl nekîr”.



Emanuel Macron:

“Îran dibe bilez û bê direngkirinê bi awayekî giştî digel Ajansa Navnetewî a Vizeya Navkî alîkariyê bike”.



Beşar Esed:

“Tişteke bi navê doza Kurd li Sûriye nîne”.



Ebas Mûsewî:

“Bernmeya mûşekî ya Îranê ji bo gotûbêjan nabe”.

Rejîma Tehranê “Corona” weke çekeke terorîstî binav dike



N: Eskender Ceiferî

Nûnerekî Meclîsa Îslamî a rejîmê îdiayê dike ku vîrûsa “Corona” çekekî biyolojîk li dijî Çîn û Îranê ye û vê weke êrîşeke biyoterorîstî binav dike.

Hişmetulla Felahetpîşe endamê Komîsyona Ewlehiyê a Meclîsa Îslamiya rejma Tehranê dibêje dibêje DYA ji bo rêgirîkirin ji berfirehbûna “Corona” li welatên navçeyê, dorpêçên li dijî Îranê rake. Wî bi îdiaya xwe amaje nekiriye ku kî ev çek li dijî Çîn û Îranê berhem aniye lê beriya wî Husên Selamî fermanî Sipaha terorîstî a Pasdaran dabû xuyakirin dibe ku “Corona”, çekekî biyolojîk be.

Beriya çend rojan jî wezareta Derve a Amerîkayê di riya wezareta Derve a Swîsê re ji Îranê re gotibû ku ew amade ne ji bo rizgarkirina xelkê Îranê ji vê vîrûsê, her karekî encam bidin. Lê di bersiva vê nameyê de wezareta Derve a rejîma Tehranê dabû xuyakirin ku ev pêşniyara DYA tenê leyîzeke siyasî ye û Meclîsa Îslamî a Tehranê jî di daxuyaniyekê de ragihandibû ku “Corona” çekekî biyoterorîstî ye û divê odeya paraştina biyoterorîzmê li Îranê bê avakirin û ji aliyê saziyek bi heman navî ve bê rêvebirin. Wî got ku divê ji xeynî saziya paraştinê a hêzên çekdar ên Îranê, saziyek bi navê Paraştina Biyoterorîstî jî bê avakirin. Ev, nerîna Husên Selamî û Hişmetulla Felahetpîşe ye û wan ji Sipahê xwaştiye ji bo vê mijarê kar bike.

Xulamriza Celalî rêveberê

saziya Paraştinê a hêzên çekdar ên Îranê hinek ji wan berpîrsên rejîmê nermtir derdikeve û dibêje ev îhtimal ketiye rojevê û ji bo nirxandinê, ketiye ber destê aliyên pêwendîdar. Lê divê belgeyên pêwîst ji bo vê hebin û em bikaribin biselmînin ku “Corona” çekekî biyolojîk e. Wî gotibû ji ber ku ev vîrûs gelek zû giştgir dibe, û herwisa ji ber ku şepêleke êrîşa çapemeniyê jî di vê derbarê de çê bûye, dibe ku “Corona” çekekî biyolojîk be.

Germkirina vê îdiayê ji aliyê rejîma Îranê ve di demekê de ye ku hin dewletên nêzîkî DYA jî weke Kûrya Başûr û Îtalya raştî pîrsgirêka “Corona” hatine û li wêderê jî gelek welatî bûne qurbanî.

Rejîma Tehranê hem dixwaze bêje DYA, “Corona” li dijî wan çê kiriye, hem dixwaze dorpêçên DYA û Ewropa li dijî wan bêne rakirin û hem jî dibêje emê bernameya xwe a pêşxistin û ceribandina mûşekan berdewam bikin.

Gotara rejîmê ku ewê bernameya xwe a pêşxistin û ceribandina mûşekan berdewam bikin, piştî daxuyaniya Komîteya Çaralî a Erebbî hat ku tê de welatên Misr, Imarat, Behreyn û Seûdiyê ragihandin ku rejîma Tehranê divê dev ji alîkariya girûpên terorîstî berde û ev kiryarên wan û herwisa bernameya pêşxistin û ceribandina mûşekan a Tehranê, li dijî reşnivîsên navnetewî ne.

Lê belê rejîma Îranê, tawan li van welatên Erebbî vedigerîne û dibêje Tehran qet piştevaniya terorê nake û ev welatên Erebbî bixwe piştananên terorîzmê ne. Ebas Mûsewî berdevkê wezareta Derve a rejîma Îranê ragihandiye ku hertim ev dewletên Erebbî, bixwe sedema ne aramî, têkçûna ewlehiyê û berfirehbûna terorîzmê li navçeyê ne. Mûsewî herwisa binavkirina Hizbullah Lubnanê weke rêxistîneke terorîstî, rexne kiriye û ragihandiye ku Komara Îslamî wê di piştevaniya

Hizbullahê de berdewam be û ev kiryara xwe, weke karekî ji bo paraştina namûsê binav dike.

Tevlîhevkirina mijarên “Corona”, dorpêç û bernameya pêşxistina mûşekan di demekê de ye ku rejîm ji bo paraştina welatîyên xwe ji “Corona”yê karên pêwîst encam nade. Hevdem amara raştî a berketiyên “Corona” jî belav nake.

Di demekê de ku raportên ne-hênî eşkere dikin ku bi sedan welatîyan di encama “Corona” de li vî welatî jiyana xwe ji dest dane, lê belê rejîm tenê hejmareke kin piştraşt dike. Herwisa ew kesan jî digire ku nûçeyên di derbarê “Corona” de bê agehdariya rejîmê belav dikin.

Li Qum û parêzgeha Elburzê ku hejmareke zêde ji xelkê bi vê vîrûsê ketine, lê belê carke din tê gotin ku divê li gor biryara rejîmê, hemû karmendên dewletê vegezin ser karên xwe û dîbiştan û zanîngeh jî careke din bêne vekirin.

Ji xeynî vê mijarê ku xemariya rejîma Tehranê ji bo rêgirtin ji belavbûna “Corona” nîşan dide, tê gotin ku heya niha jî herî kêmbalafirek, bi awayekî rojane ji Îranê diçe Çînê û xelkê bi xwe re dibe. Heman balafir jî vedigere. Eger rejîmê ji bîr kiribe ku ev vîrûs çiqasî bikuj û metirsîdar e, lê nayê înkarkirin û ev vîrûs ne sînoran nas dike û ne jî li benda biryarên dewletan dimîne ku bizane gelo wê ji bo paraştina welatîyên xwe karekî encam bidin yan jî na. “Corona” eger dewstîkird be yan jî eger vîrûsek be ku bi awayekî siruştî berfireh bûye, lê her bikuj e û divê rejîma Îranê ji bo paraştina welatîyên xwe ji vê vîrûsê tevbigere.

Li Îranê ne tenê ji bo paraştina welatîyên sîvil, belkî ji bo paraştina girtiyan ji vê vîrûsê jî karek nayê encamdan û rê li ber azadkirina wan tê girtin.

Hin pirs li ser hebûna Amerîka li rojhilata Firatê

N: Ferhan Mer'ê

W: Ebdulezîz Qasim

Heta niha xweşt û armancên ji bo man û hebûna hêzên Amerîkayî li rojhilata Firatê bi taybetî û li Sûriyê bi giştî ne xuya û zelal in, û ev ne zelalî xuya dibe di helwestên wê de yên dudilî û herwiha di bangên wê de yên çendîn car ji bo vekîşandina hêzên xwe ji Sûriyê, ku dawî vekîşandin di dema êrîşa dagîrkariya Tirkîyê li ser Serêkaniyê û Girêspî de bû, û paşî careke din bi hinceta paraştina kilîngehên petrolê, hêzên xwe vegerandin û ji helwesta xwe vegeriya, ku ev yek pirsyarekê çê dika li ser xwestekên Amerîka, ku bi rastî çi dixwaze?

Amerîka; her gav radigehîne û diyar dika ku hebûna wê li Sûriyê û rojhilatê Firatê bi taybetî ji bo şerkirin û dijberiya li dijî paşmayên rêxistina DAIŞ'ê, paraştina kilîngehên petrolê, qutkirina riya hejmongeriya Îranê û bicîhanîna biryarên navdewletî yên taybet bi çareseriya siyasî li Sûriyê ne, nemaze bicîhkirina biryara navnetewî 2254?

Lê belê, hebûna Amerîka her ji sala 2014-an ve û heta niha bi xwe ve çî şert û mercên erênî li herêmê peyda nekiriye, û berovajî ku rewşa herêmê aloztir kiriye. Ku Amerîka ji aliyekî ve ku hîn jî dosya DAIŞ wekî (Joker) li gorî xwesteke xwe bi kar tîne, tevî ragihandina jinavbirina dumahîk çeperê DAIŞ li gundê Baxozê yê li parêzgeha Dêrazorê digel hevpeymanên xwe di sala 2019'an de, hevdem ku Îran heta niha li ser zêdegaviyên xwe berdewam e, û di Sûriyayê de serbest digere bi bihêzkirina serbazgehên xwe û pêkanîna projeyê guherîna demografi digel projeyê xwe yê îdeolojî û olî li ser hesabê pêkhateya Sune mezheb bi awayekî



berfireh û sistematîk, û herwiha ku paraştina kilîngehên neftê û gazê bihaneyek lawaz e û heta niha ev mijar ne zelal e, ku Amerîka bêtî çî zehmetiyan dikare kilîngehên neft û gazê bi riya girêbestên dirêj kontrol bike, û derbarê çareseriya siyasî li Sûriyê bi rêya konferansên "Cenevre" û biryarên navnetewî jî, ku ev pêvajoyê jî her ji sala 2018'an ve hatiye qutkirin û sekinandin bi rêya konferansên Aştana û Soçiyê yên di bin çavdêriya Rûsan de, û rêkeftinên wê dawiyê yên di navbera Rûsiya û Tirkîyê û Îranê de li ser rewşa siyasî û leşkerî li Sûriyê, hevdem ku opozisyonê sûrî di rewşek herî xirab de derbas dibe nemaze ji aliyê gotûbêjkirina çareseriya siyasî digel hikûmeta Sûriyê û Rûsyayê.

Lê pirsê herî girîng ku Amerîka ji kurdan çî dixwaze? Digel hebûna Amerîkayê bi awayekî praktîk li ser qada Sûriyê ji sala 2014-an ve, Tirkîyê herêma kurdî Efrîn, Serêkaniyê û Girêspî dagîr kir, û tawanên şer û guhertina demografi li wan deverên dagîrkirî li dijî gelê kurd tene pêkanîn, û ev yek baweriyê li cem min çê dika ku peymanek stratejî di navbera Amerîka û Tirkîyê de heye, û niha ew peyman li ser erdê dibe.

Amerîka ji bo pirsê Kurdî ti projeyek siyasî pêşniyar nake, lê tenê pesnê miletê kurd dide û wî han dide li ser şerê dijeterorê û dijî DAIŞ'ê, bêtî ti rêkeftin û peymanek siyasî, çî bi HSD'ê re wekî qewarekî leşkerî û yan jî çî bi ENKS'ê re wekî qewarekî siyasî. Ji hêla aborî ve, Amerîka bi hevahengiya HSD, parzîngeh (palawgeh)ên neftê diparêze, lê miletê kurd ti sûd û qazancê ji dahatiyên neft û gazê nebîne, û berovajî ku rewşa miletê Kurd ji hêla siyasî û ewlehî û aborî ve xirabtir dibe û gihîştîye asteke herî xirab hevdem digel dagîrkariya Tirkîyê, û ambargoyên aborî, valahiya yasayî û destûrî li herêmê û dabezîn û têkçûna bihayê Lîreya Sûrî.

Tedbîrên Amerîka ji bo aramkirina herêmê hevdem digel sizayên (Qeyser) yên li dijî rejima Sûriyê çî ne?

Rêveberiya bi nav (rêveberiya xweser) erkên dewletê nake û herwiha hikûmeta Sûriyê jî erkên xwe li herêmê bicîh nake?

Hemû encam û pêşhat li ser vê dorhêlê eşkere dikin ku rola Amerîka bi giştî li ser rewşa Sûriyê, di nav de li ser pirsê kurdî neyînî ye, hevdem ku dibe (rengê) projeya Tirkîyê li ser herêmê bicîh bibe, nemaze digel bidawîhatina peymanên navdewletî yên berê "Sêvr û Lozanê" yên ku mîratê Osmaniyan di destpêka sedsala borî de dabeş kiribûn.

Korona desteke din bo mîrê serkutkar



N: Serbest Urmîye

Di sîstemên totalîter de her-tim hewil tê danê ku gel bin dest were ragirtin. Ji bo vê yekê jî, ji hemû alav û derfetekê mifah tê vergirtin. Her kar yan kiriyarek di civakê de ku ji aliyê sîstemê ve nehê pejirandin, rê ji ber tê girtin û tê qedexekirin. Wate sîstemê siyasî ku tê de hemû aliyên jiyanê taybetî, siyasî, çandî û ...htd a welatîyan tê kontrolkirin. Sîstemê hikûmetî ku ji bo berde-wamiya hikmê xwe mifahê ji îdolojiyê taybetî verdigire û di rêya çavdêrî û dest-biserdegirtina hêz, samanên giştî yên welat, ragihandinên giştî û herwiha bikaranîna teknîkên sansor û tirsandinê di welat de, pêşîya ragihandina azad, rexnegirtin û lome kirin ji sîstema hakim, asteng dike.

Sîstemek ku nekare yan hez neke azadiyê bide, bê guman xêncî serkutkirinê çî rêyeke din bo parastin û berfirehkirina desthilata xwe nas nake. Serkut tenê alavek e ku di serketina sîstemên dîktator de zortirîn mifah jê tê vergirtin. Ji ber ku ya ku bi serkutkirinê destê dîktatoran dikeve, di gotûbêj û bihiştina dengê gel de dest nakeve.

Di sîstema totalîter a Komara Îslamî ya Îranê de, emrazên serkutkirina gel roj bi roj nû dibin û dest ji çî emrazeke qirkirina gel û fetisandina dengên azad, nahê kişandin. Heya niha bo zevtkirina azadiyên siyasî û civakî di welat de xêncî qurixkirin û destbiserdegirtina samanên giştî, bikaranîna hez û desthilatê, alava herî girîng a



rejîmê bo serkutkirina gel, nan bû. Birçî hêştina xelkê bi awayeke sîstematik ji aliyê rejîmê ve dihat peyrewkirin ku têrkirina zikê tak û malbatê, civakê ber bi rûyê dehan û sedan diyardeyên nebaş di warên cur bi cur de kir. Bi awayekê ku gelên Îranê bi giştî û gelê Kurdistanê bi taybetî di rêya mirînê de jî dimeşin. Weke mînak, di jiyanê gelê Kurdistanê a bin destê rejîma Îranê de kolberî derfeta mirînê û rêyeke girîng a serkutkirina gel serbarê hemû rêyên din e ku bi salan e û di temenê herdu rejîmên Pehlewî û Îslamî de tê ditin. Wate bo rejîma Îranê kolberî emrazeke bi vec e bo kuştin û qirkirina civakekê ku dengên azad tê de tîn bihiştin.

Her weke ku me anî berbas, rejîm hertim li pey emraz û alavên nû bo xwe sepandin û cî bi cî kirina hikmê xwe digere. Eşkere ye ku belayekî weke vîrûsa Korona ku yê berbûye canê xelkê welateke berfireh û kêr û zêde pêşketî di warê nojdarî û saxlemiyê weke Çînê de, bi awayekê ku sîstema desthilatdar û hemû organên wê neçar hiştine, dikare hizreke nû bo rejîma Îranê biafirîne ku bike emrazeke bo fetisandinê. Nemaze ku di çend rojên borî de bi awayeke micid piştî çil salan kêrhatîbûna rejîmê ji bo cara yekemîn ji aliyê hemû gelên Îrane ve hate retkirin (wate gelên din bo cara yeke-

mîn, vê carê hevdengê gelê Kurd bûn).

Vîrûsa Korona serbarê vîrûsê hindê ku belayeke malvêranker e, lê hin derfet dane pêşîya rejîma Îranê. Yekem ew bû ku berpirsyarên rejîmê di astê herî bilind de, ew kire hêcetek bo careke din xapandina raya giştî li hem-ber beşdarî nekirina xelkê di şanoya wan a hîlbijartinê de û kêmbûna rêjeya beşdariya gel di şanoya han de pê pîne kir. Helbet ji aliyê din ve jî bû derfet ku rêberê rejîmê taqîma alîgir û bindestê xwe di desthilatê de razî bike. Ya din, hizra tolvêkirinê bû li bersiv nedana gel bi xwestekên Komara Îslamî û retkirina kêrhatîbûna wê rejîmê. Hekî ne, berî bi rê ve çûna şanoya hîlbijartinê ya rejîmê, belaya han di welatê Çînê de hatibû ragihandin û wî welatî serbarê girtine ber a hemû rêyên mumkin ên parastina canê hevvelatîyan, ne tenê hevvelatîyên xwe, belkî cîhan jî ji vîrûsê belayê haydar kiribû.

Piştî vîrûsê çendê ji bilî rejîma Îranê kîjan welatî, pêwendiyên xwe yên normal nemaze di warê bazerganî û geşt û seyrane de bi Çînê re berde-wam kir? Eva serbarê wê hindê ye ku rejîma Îranê ji bilî domandina bazerkganiyê, bi awayekê rêya hatin û çûnê jî bo wî welatî vala kir.

Niha belaya Korona ku

bi awayê nepenî û li gor siyaseta rejîmê berbû canê hevvelatîyan, êdî yê eşkere bûyî û bi terzeke berfireh yê hatiye û tê bilavkirin. weke tê mîzeckirin, derfetek daye destê kargêrên rejîmê bo çewisandina gel. Veşartina rêjeya nexweş û goriyên Koronayê, dizî û destbiserdegirtina îmkanatên berhingar bûnê (ji îmkanatên destpêkî ve bigire heya yên teknolojîyê ku bi awayeke normal dibe nexweşxane û navendên saxlemiyê de hebin), jor de birina bihayê hewcehiyên jiyanê bi hêceta nexweşiyê, jor de birina bazar a bors û nirxa diravên bîhanî û ya herî girîng, tirsan din û bi awayeke veşartî hepskirina xelkê di malan de û... hwd, derfeteke mezin yê daye destê dêhwê aboriya Îranê ku ew jî Spaha Pasdaran e û di bin emrê raşte raşt e mîrê serkutkar ankû reberê Komara Îslamî de ye, bo bindes-ragirtin û kontrola zêdetir a civakên Îranê.

Helbet piştî eşkerebûna belaya han di Îranê de, rejîm weke hêz û alavê zextê ne tenê di hundirê welat de, belkî di welatên derdore de jî derfetê jê verdigire. Li gor nûçeyan, rejîm nexweşên ku ew vîrûsê girtine, ne-tenê bi ser pîrrianiya bajarên Îranê de dabeş kirine (mela û xwendekarên navenda zanîstên Îslamî ya bajarê Qumê ku çavkaniya anîn û bilavbûna vîrûsê tê zanîn), rojane nûçe tîn giha-din ku nexweşan derbazî aliyan din ên sînor jî dike. Nemaze sînorên dewletên ku têde bi eşkere xwedî hêz e û rikeberiya hêzên navdewletî dike.

Ji aliyê din ve ragihandina mirina hin berpirsên rejîmê di astê bilind, bi taybetî organên parastina berjewendî û ewlekariya rejîmê de bi sedema vîrûsê, vîrûsê gumanê jî çêdike ku Korona derfeteke din e ji bo ji holê rakirina neyarên rêberê rejîmê û taqîma hemdestên wî di desthilatê de.

Hunermendê Rojavayê Kurdistanê Seîd Yûsif wefat kir

Hunermendê Rojavayê Kurdistanê Seîd Yûsif di temenê 73 saliyê de koça dawîn kir.

Malbata Seîd Yûsif ragihand, roja Çarşemê 26ê Sibatê piştî xizmeteke dûr û dirêj bo hunera Kurdî, hunermendê navdarê Kurd Seîd Yûsif li welatê Tirkîyê û li nexweşxaneyêke bajarê Stenbolê koça dawîn kir.

Seîd Yûsif li Rojavayê Kurdistanê weke “Mîrê Bizqê” dihat naskirin.

Hunermend Seîd Yûsif ew çend sal bûn, ku ji singê ve nexweşiyek hebû û li Stenbolê çareserî werdigirt. Seîd Yûsif gelek ştranên wî hene ku du ştranên wî yên bi navê “Qamişlo Bajarê Evînê” û “Oy Felek” gelek navdar in.

Herwiha ştranên “Yan Kurdistan Yan Neman”, “Çawa Tu Herî” û “Canda” ji ştranên wî



yên bi nav û deng in.

Seîd Yûsif kesekî Kurdperwer û xwedî helwestekî niştîmanî bû û hêvî û xewna wî rizgarî û serxwebûna Kurdistanê bû.

Rûdawê sala 2017 hevpeyvîneke taybet pê re kiribû û di wê hevpeyvînê de, hunermend Seîd Yûsif ji Rûdawê re dibêje: “Xwezî berî mirinê min serxwebûna Kurdistanê bidîtiba.”

Her di heman hevpeyvînê de, Seîd Yûsif behsa ştrana xwe ya li ser rêberê netewî yê Kurd Mele Mîstefa Barzanî kiriye û dibêje: “Eger hemû dîwanên xwe yên

helbestan bikim ştran, hê jî nikarim mafê Mele Mîstefa bidim. Mele Mîstefa Barzanî em fêrê kurdîniyê kirin. Di dema ku em li pey şunasî û nasnameya xwe de wêl û gêj bibûn, wî em fêrê azadî, neteweyî û niştîmanperweriyê kirin. Wî em fêrkirin, ku em gelekî pir bi hêz û mezin in. Mafê me heye weke mirovan bijîn. Mafê me heye, ku li ser xana xwe bi azadî û aştxwazî bijîn. Dikarim bêjim ku Mele Mîstefa Barzanî pêşengê min bûye. Lewma beriya 40 salan min jê re ştran got.” Di sala 2019 de, Sekreterê koçkirî yê Partiya Pêşverû Ebdulhemîd Hecî Derwêş di merasimeke rêzgirtinê de ew xelat kiribû.

Hunermendê navdar ê Kurd Seîd Yûsif sala 1947an li bajarê Qamişloyê ji dayik bûye û zêdetirî 50 salan mijûlî karê hunerî bû û ji bo huner û muzîka Kurdî xebat kir. Seîd Yûsif gotinên ştranan dinivîsand, awaz çêdikir û ştran jî digotin.

Wî di salên 1970ê de li Lubnanê komeke muzîkê ya bi navê Newroz damezrand. Ew wek yekemîn kes tê naskirin ku amûra muzîkê ya bizqê anî Rojavayê Kurdistanê. Hunermendên navdarê Kurd ê ji Rojavayê Kurdistanê, Seîd Yûsif herwiha di warê hunerî zêdetirî 25 xelatên navxweyî û navdewletî wergirtiye. Li Zanîngeha OPSala ya Swêdê jî wek rêzgirtinek jibo hunera wî, wêneyê wî li hobeyekê dersê hatiye danîn.

Rêxistina UNESCOyê di sala 1973ê de li Parîsê bi wêneyê Seîd Yûsif li ser qewanekî zêrîn û bi nexş, nîgar kiriye. Herwiha peymangehekê muzîkê yê Norvecê peykerê wî yê bronzî çê kiriye. RÛDAW

Pirtûka ‘Baxê Îrem’ hat latînîzekirin


Pirtûka Îbrahîm Doskî ya bi navê “Baxê Îrem” ku 34 şairên kurdî-kurmancî yên klasîk ên nû dide nasîn û ji helbestên wan nimûneyan berpêş dike, hat latînîzekirin.

Pirtûka Îbrahîm Doskî ya bi tîpên Erebi nivîsandî “Baxê Îrem” ji aliyê Doç.Dr. Mihemed Zahir Ertekîn ve hat latînîzekirin û Weşanxaneya Darayê çap kir.

Pirtûka Baxê Îrem herwiha çend helbestên xwedînenas jî di nava rûpelên xwe de dihawîne.

Ev berhem me haydar dike ku 34 şairên klasîk ên kurmancî li lîsteya şairên klasîk ên kurmanc zêde bûne. Heta niha dibe ku li ti derê ev şair nedihatine zanîn.

Bi vê pirtûkê dibe ku rewş û dîroka edebiyata kurdî ya Kurmancî bête guharin. Tê zanîn ku ku piştî Eliyê Herîrî



yekem helbestvanê kurdiya kurmancî Melayê Cizîrî ye, lê di vê pirtûkê de hate nivîsandin ku Mela Mehmûdê ku bi nasnavê Hemîdî tê zanîn, beriya Melayê Cizîrî helbest nivîsiye. Helbestvanên ku di vê berhemê de cih girtine ev in:

Mela Mehmûd (Hemîdî), Mîr ‘Îmaduddînê Hekkarî (Sebûrî), Mela Remezanê Ebbasî, Lexer, Axayokê Bêdarî, Sadiqê Amêdî, Muradxanê Bayezîdî û Macin, Mun’imî, Ze’îfî, Mela Husên, Nesîmî, Hacî, Sewdayî, Cudayî, Mîna, Qani, Biharî, Bazelî, Ehmedê Katibê Qubad Begê, Derdî, Mela Îbrahîmê Katûnî, Muhemmed Teyyar Paşa (Xerîbî), Xiyasî, Mela Mihemedê Pîzanî, Mihemedê Qoşlî, Yûsifê Terxan, Şêx ‘Ebdulqadirê Xanî, Ebdullahê Mexribî, Durefşanî, Mela Meqsûd (Esamî), Taha, Mela Mihemedê Soçî yê Baneyî, Sibxetullah, Mela Muhemmedê Xanî (Şewqî). RÛDAW

Binpêkirinên mafê mirov li meha Reşeme ya Îsal di Rojhilatê Kurdistanê de

Binçavkirina çalakvanekî jîngehparêz li bajarê Sine

Roja Yekşemî, 11`ê Reşeme, çalakvanekî jîngehparêz ê bi navê “Delîr Xusrewî” xelkê gundê “Zenan” a girêdayê bajarê Sineyê, ji aliyê hêzên Îtila`atê ve hate binçavkirin.

Hêzên Îtila`atê êrîşê ser mala wî welatîyê 40 salî di gundê “Zenan”ê de kirin û ew binçavkirin.

Ew çalakvanê jîngehparêz ku endamê “Komela Kurdistan a Kesk” e, piştî binçavkirinê, navbirî bo cihekî nexuya hate veguhaştin.

Heyama hepsa welatîyekî Kurd bi 2 mehên din hate zêdekirin

Biryara ragirtina welatîyekî Kurd ê bi navê “Şehram Kazimiyan”, kurê Faris û yê temen 42 salî bo 2 mehên din hate domkirin.

Ew welatîyê Kurd, rêketa 28`ê Rêbendanê, li taya lêpîrsînê a dadgeha Urmîyê de lêkolîn digel hate kirin û roja Duşemî, 12`ê Reşemê, yekemîn car bi serokatiya dadwer “Şêxlû” di taya du a dadgeha Îngilab a bajarê Urmîyê de hate dadgehîkirin.

“Şehram Kazimiyan” bi tohmata “alîkarîkirin bo yek ji Partiyên Kurd ên dijberê rejîma Îranê û piropagende li dijî nizamê” hatibû cezadan.

Roja Şemî 12`ê Rêbendanê, ew welatîyê Kurd, piştî yek meh lêpîrsîn di girtîgeha îdareya Îtil`ata bajarê Urmîyê de bo girtîgeha wî bajarî hate veguhsatin.

Meha Rezber a sala 1393`an, “Şehram Kazimîyan”, li kombûna nerizayetîyan bo piştevanîkirin li Kobanê di bajarê Urmîyê de ji aliyê hêzên ewlehî yê rejîma Îranê ve hatibû binçavkirin.

Cêkirina dosyê bo 7 hepsiyên siyasî yên girevgirtî di dadgeha bajarê Urmîyê de

Pêka zaniyariyên tora Mafê Miro ya Kurdistanê, roja Şemî, 10`ê Reşemê, 7 hepsiyên siyasî yên Kurd yên girêvgirtî di girtîgeha bajarê Urmîyê de bi navên “Kamiran Derwîşî, Siyamek Eşrefî, Kamiran Qasimî, Kêywan Reşozade, Omîd Se`îdî, Kêywan Zari`î û Riza Îsma`îlî”, ji girtîgehê bo dadgehê veguhaştine û dosye li dijî wan hepsiyan bi tohemta “alozîkirina girtîgehê û bêrêzîkirin bi berpîrsên girtîgehê”, çê kirine.

Piştî birêveçûna lêpîrsîn ji wan hepsiyan, ew bo girtîgeha bajarê Urmîyê veguhasine û heya niha ti pêwendiyek wan digel malbatên xwe tinebûne. Tora Mafê Mirov a Kurdistanê, pêka çavkaniyekê agehdar daye zanîn ku wan hepsiyan hêj deşt ji girêva birçîbûnê bernedane.

Ew 7 hepsiyên siyasî ji roja 3`ê Reşemê ve heya niha, bi sedema cî bi cî nekirina daxwazên wan li derheq odên cuda û mana wan di nav hepsiyên din de ku cezayên giştî hene cuda bikin, di rewşa girîva birçîbûnê de ne.

Li 4`ê Reşemê, piştî hilxirandin (Tehrîk) kirina hepsiyên asayî yên benda ciwanan ya girtîgeha navendî ya bajarê Urmîyê ji aliyê berpîrsê bendê “Seyîd Fatimî” ve, di navbera hepsiyên di benda ciwanan de digel wan 7 hepsiyên siyasî de şer û pevçûn qewimî bû.

Piştî wê pevçûnê, bi fermana berpîrsê girtîgeha Urmîyê, Sohrabî, 3 kes ji wan hepsiyên siyasî bi navên “Kêywan Reşozade, Kamiran Qasimî û Kamiran Derwîşî” bi qerentîneya girtîgehê hatibûne veguhaştin.

Du welatîyên xelkê bajarê Pîranşarê bi awayekî nexuya hatine binçavkirin

Roja Yekşemî, 11`ê Reşemê, hêzên Îtila`atê êrîş kirine ser mala welatîyekî bi navê “Seyîd Mîstefa Sebrî” û kurê wî yê bi navê “Seyîd Ehmed Sebrî” li bajarokê “Peswê” a ser bi bajarê Pîranşarê, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî binçav kirine.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, hêzên Îtila`atê deşt avêtine bi vekolîna mala wan û hindek tiştên kesî yên wan digel xwe birine.

Herwisa wê çavkaniyê bas ji wê hindê jî kir û got: “Seyîd Mîstefa Sebrî, piştî çend demjimêran hate azadkirin, lê kurê wî heya niha di girtîgeha hêzên Îtila`atê de ye.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Seyîd Ehmed Sebrî” piştî binçavkirinê bo cihekî nexuya hate veghaştin û heya niha ji qedera wî ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.

Heya niha sedema binçavkirina wan du welatîyên Kurd nexuyaye.

Wêneyên bidawîhatina dewreya destpêkî ya 241 a pêşmerge

